**Xizmetên RIKU bo te bikêrhatî ne, eger**

- Tu qurbanî tawanê bûbî yan wisa guman dikî
- Kesekî nêzîkî te bûye qurbanî tawanan
- Tu dik mijara tawanî de şahid î
- Ji ber tecrûbeyên xwe tu hewceyî şîret û alîkariya suhbetkirinê yî
- Wek şarezayek tu şîretan bo alîkarkirina mişteriyên xwe dixwazî

Tu dikarî bi telefonê yan li ser torê têkiliyê li gel me deynî – eger bixwazî, bi bênavî jî dive. Herwiha dikarî demekê bo hevdîtina kesî jî li nivîsgeheke me bigirî.

RIKU ne rêkxistineke hikûmî ye lê dezgeheke ji aliyê siyasî û dînî ve serbixwe ye. RIKU bi mitmaneyî alîkariya qurbaniyên tawanan dike. Bêyî ruxseta te, agahiyên te nadin ti kesekî din.

**Xizmetên RIKU bo qurbaniyên suîstîmalkirinê û bazirganiya mirovî ne jî**

• Gelo kesek (bo nimûne kesûkar, xwedîkar, hevser) hatinûçûn û têkilîdanîna te li gel kesên din bisinor dike? • Gelo ji te re hatiye gotin ku tu ji ber hatina xwe bo Fînlandê deyndar î? • Gelo tu ditirsî ku bela bên serê te yan mirovên te, eger tu bi gotina xwediyê karê xwe yan îşê xwe nekî? • Gelo tu belaş kar dikî yan meaşê ku didin te wisa kêm e ku têra mesrefên te yên zerûrî nake? • Gelo meaşê ku didin te ji meaşê ku soza wî dabûn te kêmtir e? • Gelo divê ku tu teqrîben her roj zêdetir ji 10 saetan kar bikî? • Gelo karê ku got tu ê bikî û karê ku tu niha dikî ne eynî ne? • Gelo tu tê tirsandin ku dê te ji Fînlandê vegerînin yan tu ê îqameya xwe ji dest bidî? • Gelo kesek mecbûr dike tiştekî neqanûnî bikî yan jî tiştekî wisa bikî ku tu naxwazî bikî? • Gelo tu ditirsî behsa halê xwe bikî?

Eger tiştekî wisa hatibe serê te yan mirovekî te, têkiliyê li gel daîreya li hewar hatinê ya RIKU ya nêzîkî xwe bike yan nameyekê bişîne ser **help@riku.fi**. Hemû telefon û nameyên elektronîkî bi surrî tên parastin û ew bêyî izna te nîşanî ti kesî nayên dayîn.

RIKOSUHRIPÄIVYSTYS

Xizmeta lihewarhatina qurbaniyan alîkarî û şîretan dide qurbaniyên tawanan, mirovên wan û şahidan.

BI TELEFONÊ

LI SER TORÊ

RÛ BI RÛ

## BI TELEFONÊ

**Telefona alîkar ya neteweyî**
(piranî bi fînlandî)
**116006**
(duşem-sêşem saet 13-21 û çarşem-în saet 17-21)

**Telefona şîretan ya huqûqnasê neteweyî**
(bi fînlandî)
**0800-161177**
(duşem-pêncşem 17-19)

**Nivîsgehên RIKU**
Nivîsgehên me li seranserî Fînlandê şîret û alîkariyê pêşkêş dikin. Agahiyên têkilîdanînê **www.riku.fi**.

## LI SER TORÊ

Di xizmeta torî **RIKUchat** de tu dikarî zindî bipirsî û şîretan wergirtî, herwiha bi bênavî (piranî bi fînlandî). Xizmet li vê derê ye: **www.riku.fi**.

Malpera RIKU li ser **www.riku.fi** zêdetir agahiyan pêşkêş dike. Agahiyên bingehîn bi 20 zimanan.

/rikosuhripaivystys @rikosuhrit

## ALÎKARÎ BO KESAN LI NIVÎSGEHÊN ME

Li nivîsgehên me li seranserî Fînlandê dikarî alîkariya belaş di mijarên qurbaniya tawanan de wergirî. Em herdem dikarin tercumanekî bawerpêkirî peyda bikin ku razan biparêze. Agahiyên nivîsgeha nêzîk li ser netê peyda dibin: **www.riku.fi**.

Bi rêya nivîsgehên me herwiha dikarî daxwaza kesek alîkar bikî. Li gel kesên alîkar tu dikarî bi mitmaneyî biaxivî. Ew dikariya alîkariya ruhî û herwiha şîretên têkilî proseya tawankariyê û dadgêriyê wergirî. Kesên alîkar herwiha dikarin di lêpirsînên polîsan û li dadgehê jî bi te re bin.